LÆGEMIDDELSTYRELSEN
DANISH MEDICINES AGENCY

Roj 1. juli 2019

# Dermanek bi hemen bandoran, lê erzantir

Dema ku hûn dermanekî destnîşankirî ji dermanxaneya xwe dikirin, gengaze dermanên ku hûn distînin li gel tişta ku bijîşkî di raçêtê de nivîsandiye, ji hev cuda bin. Sedema vê eve ku dermanxane dibe dermanê herî erzantir yê alternatîf ji bo dermanê û ji we re hatiye nivîsandin radest we bike, da ku bikarin xercê xwe kêm bikin. Çawaniua xebata dermanî heman e, lê erzantir e.

## Guhertoyên cuda ji heman dermanî

Kereseya çalak ev dermane ku ji bo derman kirina nexweşiyek taybet yan nîşaneyên taybet, tê bikar anîn. Herwisa di nava dermanî de materyalên zêdekirî ( materyalên bêçalak ) hene da ku reng, şikil û tamê bide dermanî. Eger guhertoyên cuda ji heman dermanî hebe, her tim materyala çalaka wan eynî ye, lê dibe ku materyalên zêdekirî cuda bin .

## Her ev qas bibandor û ewleh

Ji ber ku di nava modelên cuda yê dermanekî de eynî materyala çalak û doz wekhev hene, bandora dermanî ya wan jî wekhev dibe û ji ber vê yekê bandorên wekhev li ser nîşane û nexweşiyan hene.

Hemû dermanên berî ku bikarin bikevine nava bazarê, ji aliyê rayedarek çavdêrê dermanî, bi temamî tê ceribandin. Ev dibe hemû pîvanên kêrhatîbûnê, ewlehî û bi kalîte bûnê bê berçav girtina nav, şikil û tamê, derbas bikin.

Hemû dermanan gengaze ku bandorên kêlekî hebin. Bi piranî, bandorên kêlekî bi sedema materlaya çalak a dermanî ne, û bi vî awayî hûn çi modelên binirx yê dermanî bikar bînin û çi ji modelê erzantir yê vê, hûnê bandorên kêlekî yê wekhev tecrûbe bikin.

Bê berçav girtina vê yekê ku hûn çi dermanekê bikar dînin , hûn dikarin di nava belavoka ku gel dermanî tê radest kirin,  ji bandorên kêlekî agahdar bibin. Xênjî navê dermanî, gengaze ku şekil û rengê vê jî modelên cuda yê dermanekî cuda be, herwiha dikare agadariyên li ser bandorên kêlekî di belavokên besteyê de cuda be.

## Çima demanên herî erzantir radest we dibin?

Hemû dermanxane li Denmarka de berpirsyarin ku modelên dermanên herî erzan ku ji aliyê bijîşkê we hatiye nivîsandin, pêşkêşî we bikin.

Dema ku şîrketek dermansazî, dermanek nû berhem dike, dermanê nû ku berhem dibe, dermanê sereke tê binav kirin, û bi piranî ji bo maweya 10 salan bi mafê qeyd kirina derhênerî tê parastin. Di vê maweyê de tu şirketek din nikare ev dermanî çê bike û hewl bide ku heman dermanî bi xercê kêmtir çê bike. Piştî bidawî bûna mafê qeyd kirina derhênerî, şîrketên din maf hene ku ev dermanî wekî dermanên jenerîk berhem bikin, anku dermanên ku eynî bandora dermanî hebin, û wek dermanê orîjînal ji bo tedawiya eynî nexweşiyê tê bikaranîn. Dema ku çend model ji dermên wekhev hebin- anku orîjînal û jenerîk – bi hev re kêbirkê dikin û bihayê dermanî kêm dibe.

Bi vî awayî, hûn û civakê li ser xercê dermanî destberdan dikin.

## Hûn bi xwe biryarê digirin, ka erzantirîn dermanî dixwazin yan na.

Dermanxane, divê her tim erzantirîn alternatîfê ji bo dermanî pêşkêş bike – xênjî ku bijîşkî ji dermanxaneyê re destûr dabe ku her ev tişta ku di nava reçetê de ye hatiye nivîsandin, pêşkêş bike. Dema ku dermanxane alternatîfek erzantir ji bo dermanên we pêşniyar dike, her tim dikarin ev pêşniyarê red bikin. Hûn bi xwe biryarê digirin, ka giantirîn modela dermanî dixwazin yan modelên erzantir. Dibe ku her carê ku hûn ji bo wergirtina dermanên xwe serdana dermanxanê dikin, ev ku ka kîjan erzantir e biguhere. Ji ber vê yekê, bihayê dermanan her du hefteyan carekê diguher e.

## Pêşnîyarên bimifa ji bo bikarhênerên dermanî

- Navê materyala çalak di dermanî de bi bîr bêxin. Eger hûn li ser vê yek piştrast nînin, ji bijîşk yan dermansazê xwe daxwaza şêwirê bikin.
- Labela pakêtê jê nekin. Ji ber ku ji we re dibêje, ka materyala cardî çalak di nava dermanî de kîjane.
- Eger alerjiya we hebe, hetmen bijîşkê xwe agadar bikin.
- Eger hûn li ser çawaniya bikaranîna ev dermanî, piştrast nînin, ji dermanxane an bijîşkê xwe bipirsin.